# MESREFÊN

**Mesrefa cenazeyek çî ye?**
Cenazeyên li Almanyayê bi pareyan ne. Mesref di wan noqteyan de çê dibin:

- Derxistina belgeya mirinê
  Xebata şirketa definkirinê (tabût / birin / kaxiz û wereqe)
- Xercên goristanê (mafê bikaranîna cihê gorê ji bo 20 salan / vekirin û girtina mezel / lêçûnên îdarî)
- lêçûnên îdarî yên giştî (belgeya mirinê/ wesîqeya mirînê/tercume kirin)

Bi gelemperî, mesrefa cenazeyek di navbera 3,000 û 3,500 euro de ye. Ev mesref li ser endamên malbata merhûm in, dibe ku ji mîrasa merhûm be jî. Eger ne mumkin be ku xizm vê mesrefê bidin, wê çaxê li gorî § 74 SGB XII serlêdanek ji bo wergirtina mesrefa cenaze dikare were kirin (Ev dibe: veşartina civakî).

**Veşartina civakî**
Beriya ku daîreya refaha civakî mesrefên definkirina civakî erêbike, di her halê de lêkolînek li ser rewşa we ya aborî tê kirin. Serlêdan beriya cenaze, lê heta sê mehan şûnda jî mimkun e. Tenê mesrefên mecburî tên dayin. Hûn bi xêr hatin ku ji karmendên ofîsa refaha civakî bişêwirin.

# ÎRTÎBAT

**Stadt Leipzig**

**Amt für Stadtgrün und Gewässer**
Abteilung Friedhöfe
Friedhofsweg 3, 04299 Leipzig
Telefon: 0341 123-5700
E-Mail: friedhoefe@leipzig.de

**Sozialamt**
Wirtschaftliche Sozialhilfe
Prager Straße 21, 04103 Leipzig
Telefon: 0341 123-4523
E-Mail: wiSo@leipzig.de

**Referat für Migration und Integration**
Otto-Schill-Straße 2, 04109 Leipzig
Telefon: 0341 123-2691
E- Mail: migration.integration@leipzig.de

**Quartiersmanagement Leipziger Osten**
Eisenbahnstraße 66, 04315 Leipzig
Telefon 0341 35137913
E-Mail: qm@leipziger-osten.de

Herausgeber:
©2022 Stadt Leipzig
Der Oberbürgermeister
Referat für Migration und Integration
mit freundlicher Unterstützung des
Quartiersmanagements Leipziger Osten
und des Amtes für Stadtgrün und Gewässer

**Stadt Leipzig**
Referat für Migration und Integration

# DEFINKIRINA ÎSLAMÎ LI LEIPZIGÊ



Kurdisch - Kumanci

Dînê Îslamê parçeyek ji jiyana cihêreng a dînî û çandî ya li bajarê me ye. Qanûna Bingehîn ji hemû niştecihên Almanyayê re azadiya dînî garantî dike. Ev jî tê wê maneyê ku lûzûmiyetên dinî yên misilmanan di dema mirinê de werin rê kirin. Rêzik û fermanên dinî angorî qanûnên giştî yên derbasdar têne pêkanîn.

Li Leipzigê ji sala 1997'an vir ve li Goristana Rojhilat qunceyek ji bo mezelen/gorên misilmanan jî heye. Lê dîsa jî, gelek caran pirs û nediyarî hene ku ji bo definkirina bi erkên Îslamî kîjan tişt lazim in. Ev flyer bersivên pirsên di derheqê vê de bi kurtî dide û ji bo hemû kesan e, yên ku bi vê mijarê re têkildar in.

## Ger mirin qewimîn çi bikin?

Ger mirin li malê qewimî, pêşiyê doktorek (doktorê malbatê an doktorê acîlî) agahdar bikin. Ew ê lêpirsînê bike û belgeya mirinê bide we. Ger mirin li nexweşxaneyê çêbibe, belgeya mirinê bixweber li vir tê derxistin.

*Wezîfedarkirina şîrketa definkirinê*

Li Almanyayê cenaze tenê ji aliyê şirketa definkirina cenazeyan dikare were veşartin. Divê xizmê merhûm bi lez şirketeke definkirinê ya ku bi dilê wan e agahdar bikin.

Ew jî wan wezîfeyan tîne cîh:

- Anîn an jî birina cenaze
- Têkiliyên bi goristanê ve
- Têkilî bi daîra qeydê ve ji bo derxistina belgeya bo bûyera mirinê,
- Wergera belgeyan an organîzekirina wergera belgeyên ku ji bo derxistina belgeya mirinê hewce ne,
- Koordînasyona roja û şandina serlêdana cenaze ji rêveberiya goristanê re. Cihê mezel tenê ji aliyê xebatkarên goristanê ve dikare were vekirin û girtin.

*Şûştina cenaze*

Li Leipzigê bi tenê çend cîh hene ku li gorî emrên îslamî cenazeyan dişonê û xwediyê îmkanên minasib in. Li goristanên bajêr niha şuştin angorî erkên îslamî ne mimkun e.

*Ger minkun e, kaxezên lazim ên jêrîn organîze bikin*

Belgeyên merhûm ji bo derxistina begeyan li daîra qeydê (Standesamt):

- Ji bo destnîşankirina nasnameyê: karta nasnameyê / pasaport û belgeya îqametgehê
- Belgeyên nasnameyî:
  - Belgeya jidayikbûnê/jêgirtin ji xêzanname/cuzanê malbatê
  - Ger zewicî: belgeya zewacê yan hevkariya sivîl ya zewaca paşîn û, eger hebe, peymana zewacê
  - Ger berdayî / jinebî: Belgeya betalbûna zewaca paşîn (mînak biryara berdanê) an belgeya mirinê, eger ku yek mirî be.

Girîng: Divê hemû belge di orîjînalê de bên radestkirin û ji hêla wergêrek ku ji raya giştî re hatî destnîşankirin û bi gelemperî sondxwarî li Elmanyayê were wergerandin (ji bo vê binêrin: www.justiz-uebersetzer.de/suche_action).
Belgeya orîjînal a wergerî divê wekî belgeya hevgirtinê bi wergerê ve were girêdan.

**Not:** Amadekirin û peydakirina belgeyan ji derveyî Almanyayê dikare hin wext bigire, ji ber ku ji bo karanîna belgeyên li Almanyayê hewcedariya zêde rastrastkirinê heye. Baştir e ku hûn hema ji niha ve dest bi serlêdana wan belgeyên ku li jor hatine destnîşankirin bikin. Wusa hûn dikarin xizmên xwe ji dema dirêj ya ku merhûm bo kaxizên ji daîra qeydê nikaribe were definkirin bifilîtînin.

## Agahiyên girîng

*Dema heya tabûtkirin û definkirinê*

Li Almanyayê mirî tenê 48 saetan piştî mirina xwe, lê herî dereng 8 roj piştî mirina xwe, tên definkirin. Roja şemî, yekşem û betlaneyên fermî di hesabkirina muhletê de ne. Li Saksonyayê jî mecbûriyeta tabûtê heye. Li gorî qanûnên Saksonyayê definkirina di nav cawekî bê tabût de nayê qebûlkirin.

*Qunceyê gorên misilmanan*

Li Ostfriedhofê, li Oststrasse 119, cîhek bo mezelên misilmanan heye. Mezel ber bi Mekkeyê ve diçin û ji misilmanên ji hemû mezheban re wekhev in. Cihê mezelan ji aliyê rêveberiya goristanê û xizmên merhûm ve tê diyarkirin. Ji bo veşartina li ser qunceyê gora misilmanan razîbûna mele ne hewce ye. Hûn dikarin bi serbestî meleyekî hilbijêrin bi cenazeyê xwe re bibin. Mezel tenê ji aliyê xebatkarên goristanê ve tê vekirin û girtin.

*Koçbûna bêdawî*

Li Almanyayê demek diyarkirî heye ku li goristanan mezel/gor heta kengê bê desteser bimînin mayin. Li Leipzigê ev dema 20 sal e. Piştî 20 salan, cîhê definkirinê dikare bi xercek ve were dirêj kirin. Wekî din, ew mezel ji nû ve wekî goristanek nû ji bo definkirina misilmanan tên pêşkêşkirin.

*Sêwirandin û lênêrîna mezelan*

Xizm ji lênêrîna cihên mezelan berpirsyar in. Sêwirana mezelan dikare li ser rêwerzên sêwiranê were damezrandin. Ji bo lêkirina kevirên mezelan erêkirina rêveberiya goristanê lazim e.

**➔ www.leipzig.de/friedhoefe**